#MADANIYACONF2023

# Daxuyaniya Çapemeniyê

Ji bo Çapkirina Yekser

**Konferansa destpêkê ya Madaniya li Parîsê, Mafdarbûna Siyasî: Aktoren sivîlên Sûriye wek hevpêşkirin**

Roja Sêşemê 6ê Hezîrana 2023, nûnerên 150 rêxistinên civaka sivîl ên Sûriyê yên ku endamên li Madaniyê ne we bicivin, û herwisa nûnerên navdewletî û nûnerên taybet ji bo Sûriyê we beşdarî bibin li konferansa Madaniyê ya destpêkê li Enstîtuya Cîhana Erebî li Parîsê.

Madaniyê; însiyatîfeke bi tenê ya Sûriyeyê ye, serbixwe ji her bandoreke siyasî û biyanî, ku armanca wê xurtkirina bandora siyasî ya qada sivîl a Sûriyê ye. Dabînkirina roleke bibandor ji Sûriyan re he be di proseyên biryardanê yên girêdayî Sûriyê li ser asta lokal, herêmî û navdewletî ji dema ku Madaniyê bi awayekî fermî di sala 2023an de hatiye destpêkirin, zêdetirî 150 curbicur rêxistinên ji civaka sivîl ji hemi deverên Sûriyê, welatên cîran û ji dîasporayê ve pêşwazî kir.

Madaniyê armanc dike ku dînamîkên Sûri nîşan bide bi riya komkirina aktorên sivîl ên Sûrî li dora komek berfireh ji nirxên bingehîn ên mafan, birêxistinkirina wan di nav qadeke sivîl ya yekbûyî de, pêşkêşkirina aktorên sivîl ên Sûrî wekî hevpişk, û misogerkirina rola serkirdayetiyê di pêşerojê de ji Sûriyê re. Girîngiya van hewldanan bi taybetî te di wextê kî de ku pêlên normalîzasyon ligel rêjîma Esed zêdebû ye piştî erdheja wêranker ku li Sûriyê û Tirkiyê xist

Daxwazkirina mafê siyasî yê qada sivîl a Sûriyê di bin sîwaneke sivîl de, nayê wê wateyê ku tu daxwazek ji bo guhertina desteyên Sûriyê yên beşdar di proseya siyasî de li gorî biryara Encumena Ewlekariyê jimare 2254 nîne, lê ewe jî nava hewldanan de ye ku hewlên xwe temam bike. Ev mafê siyasî li ser pêwîstiya ku aktorên sivîl ên Sûriyê xwedî roleke bibandor bin di karîgeriyê de li ser hemû qonaxên xebatê de ji bo gihiştina çareseriyeke siyasî ya dadmend li ser bingeha mafan, û ev maf ji bo Sûriyê li gorî heman biryara Encûmena Ewlekariyê tê parastin.

Roja beriya konferansê (Duşem 5ê Hezîrana 2023) nûnerên rêxistinên civaka sivîl ên Sûriyê dê di rojeke kar a girtî de di bin sîwaneke sivîl de bicivin û li ser pêşanî û mekanîzmayên karê hevbeş di pêşerojê de gotûbêj bikin. Madaniyê ji hemû aktorên sivîl ên Sûriyê re vekirî ye ewe ku bi nirxên wê bawer dikin, ji hemû beş û deveran, di nav de rêxistinên civaka sivîl, saziyên gel, komeleyên qurbaniyan, sendîka, federasyon, navendên lêkolînê û ragihandinê û piştre kesan ji.

Sawsan Ebû Zeyn El-Dîn, rêveberê kargêrî yê Madaniyê dibêje ‘’Zêdetirî 150 rêxistinên civaka sivîl ên Sûriyê ji beş û herêmên cuda li hundir û derveyî Sûriyê dê di çarçoveya konferansê de bicivin ji bo gotûbêjkirina mekanîzmayên xebata me ya hevbeş ji bo misogerkirina beşdariya bi bandor a qada sivîl ya Sûriyê di beşdarbûna di avakirina paşeroja welatê me de bi rengekî aştiyane û demokratîk. Em mêvandariya şanderên taybet û biryarderên navdewletî yên derbarê Sûriyê de dikin, ji bo pêşkêşkirina perspektîf û xebata xwe ji bo afirandina hevkariyên rasteqîn ên ku bikarin rêyên curbicur ber bi çareseriyeke siyasî ve li ser bingeha mafan vebigirin’’.

‘’Em wek jin û mêrên Sûrî, pêdiviya me heye ji bu pêkhateyek serbixwe û berfireh ku bi rastî dengê me hilde, pêkhateyek ku rêberiya we be hemû îdyolojiya bandor ne be. Di nava Medaniyê de, em dixwazin pirên pêwendiyê ava bikin bi hemû aktorên ku di mijarên giştî yên girêdayî Sûriyê de cih digirin da ku em bigihêjin platformek ku tê de gelek arasteyên cihêreng bê dûrxistin û derveyî rastiya polarîzasyonê pêk tê. Medaniyê encama gelek hewildanên jin û mêrên Sûriyê ye ji bo avakirina platformeke serbixwe ku dengê gelê Sûriyê bilind bike ser rojeva kêşeyên nakok, bi hêviya avakirina mekanîzmayên ku dişibin me û pêkhateyên tevgera me ya sivîl ji bo gihiştina Sûriyê ke yek wek ku em dixwazin’’. Elham Aşûr - Sûriya El-Amal, rêxistineke endamê Medaniyê ye.

Ayman Asfarî Serokê desteya rêveberiya Medaniyê piştrast dike ‘’Di deh salên borî de, saziyên civaka sivîl ên Sûriyê roleke girîng di parastina nirxên serhildana Sûriyê de û pêşkêşkirina xizmetên bingehîn lîstin. Ev sazî xwedî rewatiya ku dengekî bibandor hebe dema ku li ser pêwîstî û paşeroja gelê Sûriyê gotûbêj dikin, di nav de piştgiriya her proseyeke siyasî. Medaniyê hewl dide van saziyan bi nirx û armancên hevpar bigihîne hev’’.

**Ji bo hevpeyvîn û şîroveyên medyayê, ji kerema xwe têkilî**

**Rania Elî li ser r.ali@madaniya-csn.org**